Vekolên ku li ser metnê *Qewlê Hespê Reş* xebitîne, ev cureyê edebî yê vê berhemê bi awayên cuda bi nav kirîye. M. Mehmûdê Bayezîdî (1797-1867) di serê nusxeya destnivîs a vê metnê da wiha nivîsiye: *Qewlê Hespê Reş Hikayetê ‘Elîyê Herîrî Nam’* (Aykaç, 2023: 105). R. Lescot “hikaye”, Herekol Azîzan (1941), “qewl” gotîye, Mihemed Emîn Osman (1977) “beyt”, Ebdurrehîm el-Muzûrî (1979) navê “beyt” lê daniye; peyra gotîye li ser “xeza”yê ye. T. Îbrahîm Doskî (1993) jî navê wê “beyt” daniye, peyra alîyê wê yê “xeza”yê derxistiye pêş. M. Ebdullah (2002), “beyt” û “qewl”, Z. Amedî (2002) navê “hikayet” lê daniye, peyra gotîye “qewl”, E. Varli (2004) “qewl”, Celîlê Celîl (2004) bi tevî ku navê wê yê nerîtî “qewl” lê daniye jî, ew vê menzûmeyê di bin banê “beytên poemî” da bi cih dike. M. Bozkoyun (2016) ew wekî “beyt” bi nav kirîye. Halit Yeşilmen (2016), ew wekî hikaye bi nav kirîye. Y. Kaplan (2019) wekî “beyteke dînî” bi nav kirîye. T. Î. Doskî (2020) di xebata xwe ya vê dawîyê da jê ra gotîye “qewl”. A. Yıldız (2021) cureyê wê yê edebî “xezaname”, Y. Aykaç (2023) “cengname” û K. Subaşı (2024) “xezawatname-cengname” daniye. Ji ber ku vekoleran ev alîyê cureyê edebî yê vê metnê baş zelal nekirîye, hin taybetmendiyên wê jî bi hêsanî nayên zelalkirin. Ji ber ku ev xebat hêla berhemê, bi alîyê wê yê derasayî ra têkildar e, li vir dê ev alîyê wê bihê nikirandin.

Bi tevî ku pîranîya vekoleran vê metnê wekî “beyt”, “qewl”, “hikayet”, “cengname” û “xezaname” bi nav dikin jî, di pêvajoya vekolînê da qenaet ji me ra çêbû ku divê cureyê wê yê edebî “Hikayeya Gel” be. Nexwe divê em hinekî behsa taybetmendiyên “Hikayeyên Gel” bikin.

Çawa ku Boratav amaje pê dike, zemanê berê, di nav gel da serê pêşî cureyên edebî yên mîna hikayeyên destanî, danişmendname û betilname li pêş bûne. Di pey van da wekî cureyekî edebîyata

devkî, hîkayeyên gel jî ketine nav jîyana civakî-çandî ya gel. Piştî serdemekê, ji hîkayeyên destanî zêdetir, hîkayeyên gel cihê xwe di nav jîyana edebî ya gel da xweş kirine. Bi domana demê ra derbirin û vegêrana van metnên hîkayeyên gel, wekî nerîteke edebîyata gel a devkî zêdetir bi pêş ketîye (Boratav, 1969: 54). Ji ber ku gel jê hez kirîye, hîkayebêj û aşîqan ev cure berhem di civatên gel da her û her derbirîne û êdî wan cihê metnên destanî, xezawatname, menaqîbane-wilayetname, û betilnameyan girtiye. Guhdarên piştî sedsala 16an, ji hîkayeyên li ser şer û pevçûnên ku li dijberî gelên din hatine kirin zêdetir li hîkayeyên ku mijara wan rûdanên navxweyî ne guhdarî kirîye. Lewra aşîqên gel, ev metnên wiha yên ku pexşan û nezim tevî hev in, li pêşberî koma gel derbirîne û peyra jî wan tenbûr jî tevî vê vegêranê kirîye. Digel vê bîr û raya Boratavî, helbet bivê nevê mimkun e ku cîyawazîyên cureyî yên edebîyata gelan jî derkevin pêşberî me.

Bi vî awayî mirov ji çavkanîyên dîroka edebîyatê (Kudret, 1980: 292) pê derdixe, hîkayeyên gel di pey metnên destanan da derketine holê û wan şûna destanan girtiye. Lehengên rûdanan ku di hîkayeyên gel da cih digirin, ji yên destanan zêdetir nêzî rastîyê ne. Ew rûdanên ku di wan da diqewimin, ji aliyê awartebûnê ve ji yên destan û çîrokan (metel) tixûbdartirkirî ne û bêtir nêzî rastîyê ne. Tenê ew hozanên gel ên şareza û pîspor dikarin wan vebêjin. Mijara sereke ya hîkayeyên gel “evîn” û “qehremanî” ye. Ji ber ku nahê zanîn bê ka gelo kîjan hozanî cara ewil ev cure hîkaye derbirîne, hîkayeyên gel wekî metnên anonîm dihên hesabandin. Bi tevî wî awayê xwe, ew wekî metnên edebî hatine dîtin. Bi piranî hîkayebêj wan digel enstrumanan vedibêjin. Li herêma Serhedê xelk ji hîkayeyên gel ra serguzeşt jî dibêje.

Polînkirina Hîkayeyên Gel

Zanyarên vê qadê bi du awayên cîyawaz hîkayeyên gel ji aliyên cuda cuda ve dabeşî cureyan kirine. Wan cureyên hîkayeyên gel ji hêla dirêjî-kurtîyê ve (Şener, 1996: 11) û ji hêla mijar û serkanîya wan ve polîn kirine (Pertev Nailî Boratav, 1969, s. 54).

Ji pîsporên qadê Şener, ew ji vê hêlê ve dabeşî “hîkayeyên gel ên kurt” û “hîkayeyên gel ên dirêj” kirine. Hîkayeyên kurt metna van cure hîkayeyan li dor yek rûdanekê hatiye hûnandin, binyada wê sade û besît e û qewareya wê kurt e (Şener, 1996: 11). Hîkayebêj wê li pêşberî guhdaran di nav du saetan da derdibire û diqedîne. Hîkayeyên dirêj ku hene, metna wan li dor rêzerûdanan hatine hûnandin, binyada wan berfireh e û qewareya wan dirêj e. Tê da lehengên curbicur hene. Hîkayebêj li pêşberî guhdaran jînameya lehengan bi berfirehî derdibire û ev vegêran carinan bi qasî 5 yan jî 7 şevan berdewam dike.

Hinek ji zanyarên zanista edebîyatê (Kudret, 1980: 292) hîkayeyên gel ji aliyê mijara wan ve bi awayê “Hîkayeyên gel ên evîndarîyê” û “Hîkayeyên gel ên qehremanîyê” dabeş kirine. Hinek zanyarên din ên mîna Sakaoğlu û vekolerê Fransî Edmond Saussey jî hîkayeyên gel ji hêla “esil û çavkanî”yên wan ve polîn dikin û diyar dikin ku eslê hin hîkayeyên gel destanî ye, hinek jê li ber destê aşîqên tenbûrê çêbûne û yên din jî Îslamî ne. Îca Sakaoğlu cureyê “Hîkayeyên gel ên Îslamî” li cureyên wê zêde kirîye (Sakaoğlu, 2018: 19). Hîkayeyên evîndarîyê ew cure hîkayeyên gel in ku rûdanên li ser serpêhatîyên evîndaran qewimîne vedibêjin. Evîndar bi piranî nagihîjin hev û din. Ev jî taybetmendîyên nerîta aşîqîyê bi hemû alîyan nîşan didin. Hîkayeya *Tahir ve Zühre*, *Ercişli Emrah*, *Arzu ve Kanber*, *Asûman ve Zeycan* mînakên vî cureyî ne. Hinek ji van hîkayeyên gel hene ku di bawerîya gelan da bingeheke rastîyê ji bo wan rûdanên evîne heye. Aşîq wan digel enstrumanan distrên. Hîkayeyên mîna *Kerem û Eslî*, *Aşîq Xerîb*, *Emrah û Selwî Xan*, *Summanî û Mehmet Beg*, *Kirmanşah*, di vê kategorîyê da cih digirin.

Hîkayeyên gel ên qaremanîyê ew cure ne ku li ser derbirin û vegêrana lehengekî çêdibin. Wekî mînak, hîkayeyên gel ên mîna *Şah İsmail*, *Celalî Bey*, *Yarah Mahmut*, *Latîf Şah*, *Hurşîd Bey* û *Köroğlu* li aliyê Serhedê hene û ji ber ku aliyê wan ên qaremanîyê zêdetir li pêş e, wekî hîkayeyên gel ên qehremanîyê dihên hesabandin. Bi taybetî hîyayeya gel a bi navê *Koroxlî*, çawa ku di nav edebîyata gel a Tirkî ya Tirkîyeyê da heye, di edebîyata Azerbaycan, Türkmenistan, Gürcistan, Kazakistan û Türkistanê da jî heye. Wekî din di nav civakên neteweyên din ên mîna Gurcî, Ermenî Tacik û Kurdan da jî varyantên wê hene (Boratav, 2012: 46).

Gava em dihên ser cureyê koma sêyem ku navê wî “Hîkayeyên gel ên Îslamî” ye, helbet mijara wan ew cure rûdanên dîrokî ne ku li derdora nîrxên Îslamî qewimîne. Ji ber ku vegêran bi giştî li dordora qaremanîya hin serlehengên dîrokî-îslamî teşe digire, mirov dikare wan jî wekî “Hîkayeyên gel ên dînî-qaremanî” bihejmêre. Jixwe hîkayeyên gel ên dînî-qaremanî yên mîna *Keleha Xeyberê*, *Bettal Gazî* û *Hz. Elî* jî li ser vê bingehe ne.

Taybetmendîyên Xweser ên Hikayeyên Gel

Hikayeyên gel, ji hêla “teşe”yê xwe ve bi giştî bi terzê nezmî û pexşanî tevî hev dihên derbirin. Vebêjer, hêla hestan bi awayê nezmî; hêla şayesandinê bi awayê pexşan derdibirin. Li gor Sakaoğlu piraniya metnên wan ên menzûm li ser bingeha “pîvana kîteyê” ye û hejmara kîteyên rêzikan 11-12 ye. Bi piranî di destpêka metnên wan da hin peyvên qalibî hene. Vebêjer, metna xwe bi diayê diqedîne. Zimanê hikayeyên gel bi giştî sade ye. Ji hêla “naverok”ê ve gava em li hikayeyên gel dinihêrin, dibînin ku rûdanên wan, bi rûdanên dirokî ra têkildar in. Herwiha hin leheng û tiştên awarte yên mîna Hz. Xizir (e.s.) û “hespên awarte” jî di wan da cih digirin. Bi taybetî hesp, cihekî taybet digire. Bi piranî “navekî taybet” ên van hespên ku bûne lehengên hikayeyê heye. Wekî din ew mexlûqên derveyî mirovan jî dibin lehengên rûdanan û carina diaxivin. Cihekî taybet ên van rûdanan heye, rûdan jî cihekî dîyar dest pê dike û dîsa li heman cihî diqede. Vegêrên taybet ên hikayeyên gel hene, herkes nikare wan di hizûra xelkê da vebêje. Di van cure metnan da bi giştî beşa diayê jî heye (Sakaoğlu, 2018: 4-11).

Hikayeyên Gel ên Kurdî

Vekolerên edebîyata gel a Kurdî, hikayeyên gel ên Kurdî wekî yên gelên cîran xwedan raborîyeke dûredirêj dibînin; bes bi awayekî din wan polîn dikin (Subaşı, 2023: 149): Destanên evînî û lehengî yên tîkel yên mîna *Memê Alan*, *Dewrêşê Evdî*, *Kerr û Kulik*, *Sîyabend û Xecê*, destanên xwerû evînî yên mîna *Xelîl Beg û Gewrê*, *Heso û Nazê*, *Memê û Eysê*, *Sêva Hecî* û destanên strankî yên evînî yên mîna *Gula Bayfile*, *Emerkê û Qîza Tucar Axa*, *Sosin û Ferzê*, *Esmera Şukrî*, *Silo Begê* û hwd.

Hikayeya Hespê Reş û Cihê Rûdana Wê

Di pêvajoya xebat û vekolînên têkildarî *Hespê Reş* da vekoleran bîr û rayên cîyawaz li ser cihê rûdana wê derbirîne. Bi qenaeta M. E. Osman (1977: 249), cihê rûdana *Hespê Reş* seyrangeha wan li nik gora şehîd Wuriya ye ku li Kela Şûşê ye. Wuriya, ji dema Dawud Pêxember ve maye, yaxud ji xelqê Iskenderûnê ye. Li seyrangehê Elî Herîrî, cihekî dibîne û dipirse bê ka ev çî ye. Gel û feqî jê re dibêjin ku ev cîyê Hespê Reş e û keşeyek li Şûşê hebûye, di wextê xîlafeta Îmamê Umer da bûye misilman û bi Hz. Umer ra harîkarî kirîye ku Hespê Reş jî nik qiralê Şûşê bîne. Gava feqî weha dibêjin, Elîyê Herîrî dibêje ku ez jî dê metnekî li serê bibêjim û bila navê wê derê belav bibe û xelq jî guhê xwe bidine vê suhbetê û selewatan bidin. Herîrî dest pê dike *Beyta Hespê Reş* bi li ser meqamê daweta [bêrîte] feqîyan dibêje. Wekî din li gor varyantan cihên din ên mîna Xerzan (Ç1, Ç 2; Ç3), Tor û Akrê jî wekî cihê rûdana wê hatine dîyarkirin.

Varyantên Hespê Reş

Vekoleran ji nivê dawî yê sedsala 19an ve dest bi berhevkirina metna *Hespê Reş* kirîye û hinekan li ber metna wê, nusxeyên nû amade kirine. Ji wan ê ewil Mela Mehmûdê Bazidî ye. Wî du varyantên *Qewlê Hespê Reş* dane Alexandre Jabayî. Di pey wî da êdî vekolerên Ewropî yên mîna Albert Socin li serê xebitîne. Di nav van da bi taybetî varyanta bi navê *Hikayeya Gawiran* ku R. P. Charles di sala 1936an da ji devê Elîyê Wuso girtîye balê dikêşe (Lescot, 2009: 241).

Di nav pêvajoya piştî Bazidî da zêdetirî deh varyantên vê hikayeyê hatine tomarkirin. Hinek ji wan ji devê vegêran bi xwe hatine berhevkirin; hinek jî ji destxetan hatine îstînsaxkirin. Di pêvajoya vê vekolîna xwe da em gihaştin 12 varyantên wê.

Heta niha hemû varyantên wê bi Kurmancî bûn; bes cara ewil du hebên wê yên bi Erebi bi destê me ketin. Ew jî ew in ku Halit Yeşilmen ji herêma Mêrdînê ew berhev kirine û bi navê *Meymûnê* neqil kirîye (Yeşilmen, 2016: 124). Wî ev hikaye ji devê hikayebêjekî mîrê 78 salî yê Mehellemî yê Midyadê berhev kirîye. Navê heywanekê Meymûn e, ji hespê kurtir e, ji qantirê xurtir e. Tê gotin ku ji Behra Wanê derketîye hatiye. Ev hîn zêde nêzî varyantên Kurdî ye.



Foto 1. Deyru'l-Umurê (Menastira Mor Gabriyel) ji jorê ve

Yeşilmen, varyanteke dîn ji mêrekî 75 salî yê gundê Qertmîna (Yayvantepe) Midyadê berhev kirîye: Li herêma Erxenîya Dîyarbekirê, derwêşan di êvarên înan da li ber Dergahê Şêxên Kotekan di helqeyên zikirî da ev menzûme wekî beyt gotine (Ç3). Li aliyê Xerzan jî melayan di sohbetên dînî da ev metin wekî çîrok û hîkayeyên dînî yên qaremanî ji cemaetên xwe ra derbirîne (Ç1, Ç2).

Hêmanên Efsaneyî yên Berhemê

Du cureyên heywanan di vê berhemê de wekî serleheng hatine bicihkirin. Yek jê *hesp*, ya din jî “teyrik”ek e. Ev teyrik, li gor piranîya qewlbêjên gel ku guhertoyên wan bi destê me ketine, Hehecîk e. Heywana duyem herçendî li gor guhertoyan hinekî biguhere jî, bi giştî hespekî reş ê efsaneyî ye ku jixwe hozanan navê wî li berhemê danîye.

Hespê Efsaneyî

Hem di metnên dînî yên Îslamî da hem jî di metnên edebîyata devkî ya Kurmancî da cihekî giring ê hespên reş heye. Lewra li vir me divê serê pêşî em behsa metnên dînî bikin û peyra jî ya edebîyata Kurmancî.

Hinek hedîs jî li ser xêr û xweşîya hespan hene ku me ew ji berhema bi navê *Cem’ul Fewaid, Min Cami’il Usûl we’l Mecma’iz-Zewaid*, beşa “cîhad”ê û xêra hespan dîtin.

Ebû Qetade ev derxistîye: “Bixêrtirê hespan, ew hespê reştirîn ê beş e ku lêva wî ya jor belekokî ye, îca piştî wî cureyî, ew hespê reştirîn e ku sê lingên wî çal in, lê lingê wî yê pêş ê rastê, ne çal e. Heke yê reştirîn tune be, îca dor dihê ser wî hespê kumeyt (sor) ku li ser van wesfan e.” (er-Rudanî, 2012: 412-413).

‘Urwetu bin Ce’id ev derxistîye: “Hesp, heta roja qîyametê jî bijîyê/biskê enîya xwe, bi xêr, ecir û xenîmetê ve girêdayî ye.” Ebû Kebşete ew derxistîye: “Hesp, heta roja qîyametê jî bijîyê/biskê enîya xwe, bi xêrê ve girêdayî ye, ehlê wê ku li ser wê alîkar in û nefeqeya/mesrefa wê didin, wisa ne mîna ku bi destê xwe, tim sedeqe belav bikin.” Ebû Zerr ew derxistîye: “Tu hespekî Erebi tune ye ku di wextê her seherê de, jê ra îzîn neyê dayin ku ew van her du duayan bike: Ya Rebbî, ji Benî Ademîyan, te ez ji kê ra xwestim, ji wî ra te ez bexişandim, tu min jê ra bikî wî ehl û malê ku herî zêde li ber dilê wî şîrîn e, yan jî tu wisa bikî ku di nav ehl û malê wî da wisan bim ku herî zêde jê hez dike.” (en-Nesaî, 2013: 585).

Di edebîyata Kurmancî ya gel de, motîfa hespan, gelek berbelav e. Di hîkayeyên gel ên anonîm de, *hesp* wekî lehengekî sereke hatîye bikaranîn. Ev hespên ku di efsane û destanên siruştî yên gel da navên wan hene, awarte, giranbûha û xusûsî ne. Di hîkayeya gel a devkî ya *Mem û Zînê* da jî hespekî efsaneyî heye. Navê wî *Bozê Kurî Behran, Bozê Rewan yan jî Boran* e. Ew jî, dema ku Mem ji bajarê bavê xwe derdikeve, ne bi dilê dê û bavê wî ye û wan lingên hespî qeyd û lele kirine. Gava ew dike ku ji bajarê Muxurbîyan derkeve, mîr derîyê bajêr lê girtine, hesp bi ser sûra vî bajarî de ferqaz dide. Bi rê da, haya Memî jê tune ye; lêbelê lingê wî lele kirîye. Xoceyê Xizir dihê hawara wî û haya Memî pê

dixe.¹² Mem, li ser piştâ vî hespî digihîje welatê Zînê. Gava digihîje Cizîra Botan, camên xaniyên bajêr, ji ber şihîna *Bozê Kurî Behran*, dişkên.

Motîfa hespan, di *çîrokên gel* ên Kurmancî de jî bala mirovan dikêşin. Di çîrokeke *Mîrze Mihemed* de, hesp wiha derbas dibe: “Hebû padşak, du hev kurê padişê hebûn. Navê yekî Mîrze Mihemed bû, navê yekî Elî bû. Padişâ qet rû nedida Mîrze Mihemed. Rojekê Mîrze Mihemed diponije û divê: Qet rûmeta min li cem bavê min tune. Rabû hespê xwe yê Behrî siyar bû. Ji malê derket. Terkedunya bû çû.”.

Di hikayeya gel a *Reşîd Paşa û Xezalê* da hespeke efsanewî heye ku navê wê, *Xedra* ye. Reşîd Paşa, bêtî vî hespê nikare dilketîya xwe ya bi navê Xezalê bîne. Bavê Reşîd Paşa, ev hesp veşartîye û naxwaze bide kurê xwe. Ew jî wezîrên bavê xwe dixwe dewrê û bi vî awayî Xedrayê jê distîne û qesda welatê Xezalê dike.¹³ Bêjeya “xedra” di zimanê Erebi de tê wateya “kesk”îyê. Li gor gramera zimanê Erebi zayenda wê “mê” ye (el-Meqdisî, 1432: 188).

Di destana *Ker û Kulik* de hespekî efsaneyî yê Axayê Erebi Gêsi heye, navê wî *Bilêcan* e. Emer Axayê Kurd, dixwaze ku vî hespî bi dest bixe, jî bo vî yekê jî, Kulik dişîne ku wî bîne (Zilan & Roşan, 2004: 105). Herweha, mehîneke din jî heye ku mîtolojîk e. Navê wê *Sosik* e. Di destana *Ker û Kulik* da hespê bi navê *Bilêcan* jî mîtolojîk e. Ev hesp li cem eşîra Gêsiyan e. Rojekê çend derwêş dihên mala Emer Axayê Zengûzêrîn, jî xanima malê ra dibêjin ku her tiştê vî malê temam e; mixabin *mehîna Bilêcan* jê kême. Xanim dibêje ew çi mihîn e? Derwêş wiha bersiva wê didin:

Bilêcan mehînek e

Mehîneke kiras-kırıye

Kirasê çarbask-kırıye

Çarbaska wê kilit- kırıye

Mifta kilitan li cem qıza Elisarê Gêsi ye (Aras, 1996: 26).

Hespeke efsaneyî di *Destana Rûstemê Zal* de jî heye. A. Sosin û E. Prym ku li ser hikayeya *Rûstemê Zal* berhevkarî kirine, li ser hespa Rûstemî ev agahî dane:

“Wekî rabû ser xwe, Rûstem fikirî, şev e, carek di nivîstekî di xew re çû. Milyaket hate ser, gote Rûstem: Rabe ser xwe, carek li fecra sibehê de here ber gevenda behrê, ji xwe re çalekê bikole, hindek qirş û qelaş bavêje ser xwe û rûne li wê derê. Gavekê te dît mehînek dê derkevît ji wê behrê. Destê xwe navêje wê mehîne, bila biçit ji xwe re biçêrit, tu ji cihê xwe nelive, paşî wî, wê bihnekî pêl dê bikevin behrê, behr bibit du qat, hespek dê ji nav derkevît, ew hespê çawan a, belek e mîna ya pilingan e, punyek sor e, punyek spî ye, punyek reş e. Wekî te dît derket, tu navê xwe û welatê xwe jê re bêje, hesp bi xwe dê êt li ber te sekinit. Rûstem veciniqî, ji xewê rabû, kete mitala ji xwe re got ev xewn e, careke din çavê xwe dide hev, lê ew milyaket dişa hat ser got: Rûstem rabe ser xwe, ew ne xewn e, ez qesîdê Ellah teala me. Rûstem ji xewê radibe û sibê diçe ber behrê, çawa ku jê re hatiye gotin û wisa jî dibe.” (Aslan & Ismail, 2025: 176-177).

Di *Qewlê Hespê Reş* de şair, *hesp* bi ser sûrê de dide firandin. Li gor vî helwestê, ev jî bo şair, hunereke vegêranê ye. Ji ber ku mebest jî vî qewlî diyarkirina lehengiya Hz. Umer e, bala merivan lê ye ku motîfên epîk bêtir derketine pêş. Ev bi xwe jî, taybetîyeke xas a destanên siruştî xuya dike. Vegotina alegorîk a xeyalî ya şairê Kurd, xwe li vî derê dide der. Lehengên mîtolojîk, rûdanên awarte, reng û rûyê berhemê hê bêtir kirîye delavê cureyê edebî yê hikayeya gel a qaremanî û îslamî. Dibe ku ev xax û şarezatî jî Elî Herîrî be jî; dibe ku wî ev hemanên wiha, jî gencîneya edebîyata devkî ya gelêrî jî girtibe. Heta navê hespê Hz. Elî *Duldul* jî di vî berhema wiha da derbas bûye. Duldul, ew qantira boz [rengê reş û spî tev li hev] e ku Hz. Muhemmed Pêxember ew daye Hz. Elî (Develioğlu, 2021: 2019). Di hilberên

¹² Ev varyanta devkî ya *Mem û Zîna* menzûm, li ber destê me heye û me ew jî bandekî Dengbêj Zahiro girtiye. Sala 2000î me li Diyarbekirê digel wî û Dengbêj Salihê Qubînî roportajek kir. Bandê wî jî li cem me heye.

¹³ Me ev hikayeya gel ji Yasin Kayayê gundê Holê yê Hezoya Batmanê di salên 1998an da berhev kirîye. Bêjeya *Xedra* bi zimanê erebî dihê wateya *keskîyê*. Zayenda wê jî li gor rêzimanîya erebî, *mê* ye (el-Meqdisî, 2011/1432: 188).

devkî yê edebîyata gelêrî yê Kurmancî da jî em rastî motîfeke erênî ya hespê dihên. Xeberdana hespê bi zimanê Farisî, naskirina wê ya mora Hz. Pêxember gişt wekî hêmanên mîtolojîk derketine pêş.

Çûk/Hehecîk

Di guhertoyên hikayeya *Qewlê Hespê Reş* ên derdora hêla Salmasa Îranê, Behdînan, Colemêrg, Serhed, Batman,¹⁴ Pasûr¹⁵, Erxenî,¹⁶ Tor û Ruhayê da gava ku Hz. Umer di Dêra Filehan da dikeve bin hesara şervanên xirîstîyan, çivîka ku navê wê “Hehecîk” e¹⁷ û rengê wê reş û spî ye, dihê cem Hz. Umer û halê wî dibîne. Hz. Umer rewşa xwe û Borê Qer li ser kaxizekî bi xwînê dinivîse, li lingê Hehecîkê dilefîne. Ev teyrik ji dêrê derdikeve ku xebra rêgirtina Hz. Umer bigihîne Medîneyê. Şervanekî wir, dibîne ku wa ye Hehecîk ji bal Hz. Umer derket, tavi lê fam dike û ew jî alîkarê wî ye û tîrêkê berdide wê, tîra wî li qimçika Hehecîkê dikeve, qimçika wê diqelişe û hîna qimça vê çivîkê qelaştî ye. Gel vê rewşê wekî vê rûdana efsanewî qebûl dike. Lewre ev hehecîk, di nav gelê gundan de pîroz e û heta van salên dawî jî, ew di serê biharê de dihatin diketin hundirê eywan û sefikên malan û wan di arîkê xaniyan da li ser kêranan hêlîna xwe çê dikir, hêk dikir, qip diket, têjik dianîn û têjikên xwe xwedî dikirin heta ku firoke dikirin, tu kesî dest nedida wan. Hema hema di hemû nusxe û varyantên vê hikayeyê da, ev motîfa mîtolojîk heye. Wekî mînak di guhertoya/varyanta *Ebdullahê Hesena* da rûdana hehecîkê wiha ye:

Weqtê ku Umer di dêrê da ketîye
Dibîne Hehecîkek hatîye
Divê Hehecîka ser hêlînê
Cewabê bibe Mek û Medînê
Bibê kafira Umer anîye ber girtinê

Hehecîk hatîye Medînê,
Li ser çoka Resûlallah danîye
Xwedê zar û ziman bi deva xistîye
Gotîye kafira Umer anîye ber mirinê bi xwe ye

Resûlallah li Hz. Elî kirîye qîrîn e
Hz. Elî rabûye Duldul ji tewlê derxistîye
Divê nizamî cih û meskenê Umer li ku ye (KÇ4).

¹⁴ Ali Yıldız, temenê wî 62 ye, gundê wî Holê ye, li ser Hezoya Batmanê ye. Hecî Mihemedê Hecî Evdile (Erol) jî ku ji heman gundî ye û 71 salî ye, bi heman awayî ev gotîye. (Di sala 2014an da hevdîtina taybet li gundê Holê).

¹⁵ Abdullah Çakır, ji gundê Hesena (Kulp), 55 salî, wî jî 50 sal berê, li gundê Hesena, ji xalê xwe yê Mihemed Kuntaş girtiye. Mihemed Kuntaş, mîna derwêşan bûye û karê ew bûye, van beytên dînî di civatan de, bi mekin gotine. Di sala 2014an da, Ebdullahê Hesena, ev *Beyta Borê Qer*, li mala xwe ya Dîyarbekirê, di 9ê meha Adarê de ji me re got û min jî ew qeydî kamerayê kir.

¹⁶ Hecî Huseynê Zaza, 70 salî. Xwendin û nivîsîna wî tune ye; hem bi Kurmancî dizane hem bi Kirmanckî/Zazakî. Wî ev qewl, di sala 2005an da li gundê Beşiktaşê, bi kurmancî got.

¹⁷ Herçendî piranîya vegêran tenê dibêjin “çûk”; bes di yek varyantekê da navê Hehecîkê derbas dibe. Di nav gel da wekî efsane behsa Hz. Umer û Hehecîkê û vê rûdanê dihê kirin.



Foto 1. Fotografê Hehecîkê

Nîqaş

Vekolerên ku li ser metnên *Hespê Reş* xebitîne, wekî cureyên edebî bi giştî ev nav lê kirine: Qewl, beyt, cengname, xezaname û hîkaye. Jixwe di nav xelkê da jî kêr zêde ev nav hene. Di vê rweşê da dê ne dûrî rastiyê be ku em van bîr û rayên xwe derxin pêş:

1. Ji ber ku beytbêjan ev metn di rê û resmên ayînî da, li ber dergah û tekyayan, rojên êvarên înan, di nav helqeyên zikirî da jî bo cemawer û cemaetan, bi awayê newayî li ber elbaneyê gotine, dibe ku êdî bi domana demê ra wekî “beyt” ketibe ser zar û zimanê gel. Çunkî ev metin, ji hêla teşeyê xwe ve jî di dirûvê wan beytan da ye jî ku derwêş/dewrêş wan ligel elbaneyê dibêjin.

2. Ji ber ku ji hêla mijara xwe ve dinî ye û bi teşeyê xwe dişibihe qewlên Êzdiyan, dibe ku vî navê “qewl”î girtibe. Heta dibe ku ji ber têkildariya xwe ya bi qewlbêjên Êzdiyan ra dibe ku navê “qewl”î girtibe. Jixwe ev metin jî mîna qewlên Êzdiyan menzûm e û bi zimanê gel hatîye hûnandin.

3. Ji ber ku rûdana eslî ya vê metnê li ser şerê di navbera kesên misilman û yên nemisilman da ye, dibe ku navê “xezaname” û “cengname”yê girtibe.

4. Di serî da Mela Mehmûd, peyra Zenynelabidîn Amedî ev metin wekî “hîkaye” bi nav kirîye. Ev jî ji bo vî cureyî dibin delîl ku mirov vê menzûmeyê wekî hîkayeya gel bihesibîne.

5. Delîla jorîn mimkun e ku têra ku cureyê edebî yê vê berhemê “hîkayeya gel” e neke û dibe ku em bi îtirazeke wiha ra rû bi rû bimin. Ev metin kurt e û menzûm e. Hal ku hal e metnên hîkayeyên gel, nezm û pexşan têkel in. Li vir em dikarin berevanîyeke wiha bikin: Gava em hemû varyantên ku li ber destê me hene li ber çavan bigirin, em dê bibînin ku nezm û pexşan têkel in. Jixwe ev metin, bi domana demê ra jî metnê wê gelek beş ketine.

Bi tevî van hemû xalan gava em ji aliyê “teşe” û ji aliyê “naverok”ê ve li metna *Qewlê Hespê Reş* mêze dikin, bi hêsanî dibînin hema hema temamê van taybetmendiyên li jor ên “hîkayeyên gel” ku di daneyên giştî da behsa wan hat kirin tê da hene. Nexwe em dikarin wê wekî “hîkayeyeke gel qaremanî ya Îslamî” bihesibînin. Di vê rewşê da jî ber mijara wê qaremanîya lehengên Îslamî ne, em dikarin cureyê metna *Hespê Reş* jî, wekî “hîkayeya gel a dinî-qaremanî” bihesibînin. Çunkî “hespên awarte” jî di wan da cih digirin. Bi taybetî hesp, cihekî taybet digire. Bi piranî “navekî taybet” ên van hespên ku bûne lehengên hîkayeyê heye. Jixwe di van cure hîkayeyan da ew mexlûqên derveyî mirovan jî dibin lehengên rûdanan û carina diaxivin. Cihekî taybet ên van rûdanan heye, rûdan jî cihekî diyar dest pê dike û dîsa li heman cihî diqede. Vegêrên taybet ên hîkayeyên gel hene, herkes nikare wan di hizûra cimaetan da vegêre. Di van cure metnan da bi giştî beşa duayê jî heye. Ji vî aliyê xwe ve jî *Hespê Reş* dikeve bin kategoriya hîkayeyên gel ên Îslamî yên qaremanî.

Encam

Ji giştîya daneyên vê xebatê û analîza wan dîyar bû ku di hîkayeya *Hespê Reş* da li ser pêxemberê Îslamê Cenabê Muhemmed, xelîfeyê wî Hz. Emer bin Xetab, Hz. Elî, qewmekî ne-misilman û rahibekî wan hin rêzerûdanên ayînî-dînî qewimîne. Di nav serlehengên rêzerûdanan da lehengekî efsaneyî yê bi navê Hespê Reş û çûkeke bi navê Hehecîkê wekî lehengên giring cih girtine. Herçendî li gor varyantan biguhere jî, mekanê van rûdanan wekî herêma Behdînan, Xerzan û Torê hatine destnîşankirin. Helbet xezayên sehabîyên Hz. Pêxember li dijberî nemusliman çêbûne û van şeran bi awayê metnên edebî di pirtûkan da cih girtine. Ev rûdana navbihûrî ya *Hespê Reş* jî dibe ku li ser vê bingehe hatibe hûnandin û peyra vegêran ew li gor nerîta devkî hûnabe. Lewra bivê nevê alîyê efsaneyî û derasayî yê vê hîkayeyê zêdetir derketîye pêş. Ev motîfên efsaneyî yên di vê hîkayeyê da guhdarên xwe ji alîyê hestan ve dixê nav coş û xuroşê. Ev wisa xuyaye ku têkildarî cureyê edebî yê vê berhemê ye. Lewra di pêvajoya vekolînê û berhevkirina daneyên têkildarî mijarê da ew qenaet çêbû ku cureyê edebî yê vê menzûmeyê hîkayeya gel a qaremanî ya îslamî ye.

Bi qasî ku ji vegêrana vegêrên vê hîkayeyê dîyar dibe, bi mebesta ku hezkirina lehengên dînê Îslamê di nav gel da zêde bikin, wan digel rewîştên wan ên rastî, hin lehengên dûrî rastîyê li metnên vê hîkayeyê zêde kirine û wan ew lehengên rasteqînî yên dînî ji rastîya dîroka Îslamê bi dûr xistine. Bi tevî vê taybetmendîyê jî metna vê hîkayeyê di nav Kurmanc û Erebên Mêrdînê da cihekî giring girtîye. Mirîd û beytbêjên serbixwe yên geryar û beytbêjên girêdayî terîqetan ev metin bi awayê newadarî li pêşberî komên gel serdemeke dûredirêj mîna beytên dînî gotine û hin beytbêjên serdema îro jî dibêjin. Armanca wan bi vî awayî ew bûye ku bawerîya têkoşînê ya musliman, li dijberî ne-musliman zindî bigirin. Vê jî di dîroka edebîyata devkî ya gel a milletên muslîm da wekî nerîteke edebî cihê xwe girtîye.

Pêşnîyaz

Metna *Hespê Reş* ku em li serê xebitîn, çawa ku ji bo edebîyata Kurdî ya gel a dînî-tesewwufî giring e, helbet ji bo edebîyata giştî ya Îslamî jî giring e. Di pêvajoya vekolînê da gava em li lîteratura qadê digerîyan, me di tu xebateke edebîyata Erebî, edebîyata Tirkî û edebîyata Farisî da agahîyeke têkildarî vê metnê nedît. Hem jî di xebatên edebîyata berawirdkirî da jî em rast lê nehatin. Heke piştî vê gotarê xebatên edebîyata berawirdî di nav berhemên edebîyata neteweyên Îslamî da bihên kirin, ev metna *Hespê Reş* jî li ber çavan bihê girtin, em bawer dikin ku ji bo edebîyata giştî ya Îslamî dê bibe destkeftîyeke hêja.

Daxuyanî û Ravekirin

1. Beyana lêkolîner a rêjeya kedê: Di amadekirina vê gotarê da tenê keda yek nivîskarekî çêbûye. Di merheleya dîzayna lêkolînê, analîza daneyan, rastnivîsîn yaxud raçavkirinê da, tenê yek nivîskarek xebitîye. Lewra rêjeya kedê ya nivîskarê yekem, % 100 e.

2. Pevçûna berjewendîyan: Tu berjewendîyeke şexsî, bazirganî yaxud sazîyane ku bibe sedema pevçûna nivîskarekî, di pêvajoya amadekirina vê gotarê de ne mewzûbehs e. Lewra tu pevçûne berjewendîyê dernakeve pêşîya wê.

3. Rapora etîkê: Di vê lêkolînê da belgeyeke îzna etîk nehatîye wergirtin. Çinku giranîya vekolînê li ser belge û dokumanan pêk hatîye. Wekî din tu pêvajoyeke daneyan ku têkildarî mirov û heywanan be di nav xwe da nahewîne.

4. Modela lêkolînê: Ev xebat wekî gotareke lêkolînê hatîye sêwirandin û dîzaynkirin û berhevkarî jî pê ra hatîye kirin. Di pêvajoya vekolînê da xebatên ku berê, bi zimanê Erebî, Tirkî Almanî û ji dîyalektên Kurdî bi Soranî û Kurmancî hatine kirin û têkildarî vê qadê ne, di ber çavan ra hatine derbaskirin û encamên ku wan bi dest xistine hatine xwendin û nîrxandin. Di pey xendina lîteraturê da vekoler derketîye qadê û li cografyaya ku wekî Herêma Başûr Rojavayê Anadoluya Tirkîyeyê tê zanîn, ligel axiverên Kurmancî hevdiîtin hatine kirin. Ji çavkanîyên zindî yê de verên mîna Batman, Diyarbakir, Ruha û Mêrdînê, varyantên *Hespê Reş* ku mijara vekolînê ye hatine berhevkin.

5. Agahdarkirin: Me ev xebat, berê di bin banê Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı Tezli Yüksek Lisansê da di asta tezê da tenê wekî “metin û vehûrîn” pêk anîbû. Xebata me di sala 2015an da ji “parastin”ê derbas bû û li ser Yöktezê hatîye weşandin. Ji bilî vê, me metna teza xwe hinekî din jî bi xebatên nû dewlemend kir û di sala 2021ê da di nav Weşanên Peywendê da wekî pirtûk çap kir. Çi heye ku piştî ku nêzî 4 salan bi ser de derbas bû, çawa ku me xebatên nû di lîteratura qadê da dîtin, careke din me pêdivî bi xebateke gotarî dît û me ev mijar ji alîyekî din ve vekola.

References

- Abdurrahman Adak. (2013). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk* (1. bs, 1-1). Nûbihar.
- Ahmet Aras. (1996). *Kerr û Kulik, Mitolojîya Kurdi da Destanek* (1. Basım). Weşanên Deng.
- Ayhan Yıldız. (2021). *Qewlê Hespê Reş: Lêkolîn û Metn* (1. Basım). Peywend.
- Bayezidî, M. M. (2010). *'Adat û Rusûmatnameö Ekradiye* (1. Baskı). Nûbihar.
- Bozkoyun, M. (Ed.). (2016). *Beytên erbanê* (Çapa yekem). Nûbihar.
- Celîl, C. (Ed.). (2004). *Keşkûla kurmancî: Sedsalîyên X - XX*. Verein zur Erforschung und Förderung der kurdischen Sprache, Kultur und Geschichte.
- Cevdet Kudret. (1980). *Örneklerle Edebiyat Bilgileri, II* (C. 2). İnkılap ve Aka Bazımevi.
- Ebdulreqîb Yûsuf. (1988). *Şaîrên Klasîk ên Kurd* (Çapa 1). Jîna Nû.
- Ebî Abdurrahman Ahmed bin Şuayb bin Ali el-Horasanî en-Nesaî. (2013). *Suneu 'n-Nesaî* (3. Basım, 1-1). Darul Kutubul İlmiyye.
- Ehmedê Xanî, & Varlî, E. M. (2004). *Dîwan û jîrewarî ya Xanî*. Sîpan Yayîn Evî Yayînlerî.
- Ferit Develioğlu. (2021). *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*. Aydın Kitabevi Yayınları.
- Halit Yeşilmen. (2016). *Sosyo-Kültürel Değişim ve Etno-Dini Kimlik İlişkileri Örneği*. Erciyes Üniversitesi.
- Herekol Ezîzan. (1941). Klasîkên Me—An Şahir û Edîbên Me ên Kevin. *Hawar*, 2(33), 8.
- Hîlmî Akyol. (2019). *Dengbêj û Çîrokbêjên Xerzan I* (1. Basım). J&J.
- Hîlmî Akyol. (2023). *Baqek Çîrokbêjên Gelêrî I* (1. Basım). J&J.
- İdris Demir & Zehra Görkem Duran Gültekin. (2022). *Batman Halk Kültürü* (1. BASKI). Batman Üniversitesi Yayınevi.
- İkram İşler. (1998). *Çîrokên Gelêrî û Destana Şemikê Bêdiran* (1. Basım). Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Kaplan, Y. (Ed.). (2019). *Beyt û destanên kurdî* (Çapa yekem). Nûbihar.
- Kenan Subaşı. (2023). *Fesad û Bêbextî di Trajediya Evînê da: Wku Nimûne Destanên Evînî yên Mêjûyî*. 14(1). <https://dergipark.org.tr/tr/pub/sarkiat/issue/85960/1425264>
- Kenan Subaşı. (2024). Ji Mitolojîyê Ber bi Tarîxê û ji Lehengîyê Ber bi Evînê Destan Weku Çemkeke Sîwan di Vegêrana Gelî da. *e-Şarkiyat*, 16. <https://dergipark.org.tr/tr/pub/sarkiat/issue/85960/1425264>
- M. B. er-Rudanî. (2012). *Cem'ul-Fewaîd min Camî'ul-Usûl we Mecmai'z-Zewaid* (C. 4). İz Yayıncılık.
- Marûf Xeznedar. (1998). Zembîlfiroşa Feqîyê Teyran. *War*, 4.


- Mihemed Ebdullah. (2002). *Beytên Kurdî: 17 Beyt ji Folklorê Kurdî*. Wezareta Perwerdê.
- Mihemed Emîn Osman. (1977). *Dîwanê Melan*. Emîndarîya Giştî ya Rewşenbîrî û Lawan.
- Mistefa Aslan & Farouk Ismail. (2025). *Koleksiyona Hikayet û Kilamên Tûr Abidîn û Botanê* (1. Basım). Weşanên Wardozê.
- N. Bilge Şener. (1996). *Hurşit ile Mihri Hikâyesi (İnceleme-Metin)* [Ankara Üniversitesi]. https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/tezDetay.jsp?id=a6xtoN_BIBFFbat9hcYobw&no=a6xtoN_BIBFFbat9hcYobw
- Pertev Naili Boratav. (1969). *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*. Gerçek Yayınevi.
- Pertev Naili Boratav. (2012). *Halk Hikâyeleri ve Halk Hikâyeciliği*. Tarih Vakfı.
- Perwîz Cihanî. (2020). Du Helbestên Neweşandî ji Keşkülên Koleksiyona Elêksander Jabayî. *Nûbihar*, 152.
- Reşo Zilan & Serdar Roşan. (2004). *Destanên Kurdî, Ji Zargotina Kurdî*. Weqfa Kurdî ya Kulturî ya Stockholmê.
- Roger Lescot. (2009). *Yezidiler: Din, Tarih ve Toplumsal Hayat, cebelê Sincar ve Suriye Yezidileri*. Avesta.
- Saim Sakaoğlu. (2018). *Halk Hikâyeleri*. Anadolu Üniversitesi.
- Tehsîn Îbrahîm Doskî. (1993). *El-Medxel li Dîrasetî'l-Edebi'l-Kurdî el-Mudewwîn bi'l-Lehcetî'ş-Şîmalîyyetî*. Menşûratî Cemîyyetî 'Ulemai Kurdistan.
- Tehsîn Îbrahîm Doskî. (2020). *Şerha Bermaya Dîwana 'Elîyê Herîrî* (1. Basım). Nûbihar.
- Yakup Aykaç. (2023). *Muceme'a Xezelyatêd Şu'erayêd Kurmancan* (1. Basım). Peywend.
- Yûsuf Zîyaeddîn Paşa el-Xaldî el-Meqdisî. (1432). *El-Hedîyyetu'l-Hemîdiyyetî fî'l-Luxetî'l-Kurdiyyetî*. İçinde X (1. Basım). Mektebetu Dîyarbekir.

Çavkanîyên Kesên Zindî

- KÇ1** Alî Yıldız, (Temen 62), sala 2014an li gundê Holê/Taşlıdere ku li ser Hezo/Kozluk - Batman.
- KÇ2** Hecî Mihemedê Hecî Evdile, (Temen 71), li gundê Holê sala 2015an, Hezoya Batmanê.
- KÇ3** Mehmed Nuri ASLAN-Kotekan, (Temen, 65), sala 2014an li mala wî ya Erxenîyê/Dîyarbekir.
- KÇ4** Abdullah ÇAKIR, Hesena, (Temen, 55), sala 2014an li Dîyarbekirê.
- KÇ5** Hecî Huseynê Zaza, (Temen 70), di sala 2005an da li gundê Beşîktaş Erxenîyê.



Bergê xebata Albert Socin



Rûpelê pêşî yê Nusxeya Zeynelabidîn Amedî

